

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT





**HÊJE MÊJE EMÊ NUHA ÇEND**

**ÇIROK Û MESELÊN XWE**

**JI WERE BÊJIN**

**Kulîlk**

**Sal: 1989**

## **Çîrok: KAR, GÎSK Û NÊRÎ (4)**

**Werger: Bavê Hêvî**

**-Nêrî simê xwe bi quwet li pirê xist.  
Ji dêw vekîşîya bi hemd û hela xwe  
bi serîya çû dêw. Qoçelên xwe li  
zikê wî xist dêw firand û avê te nava  
çem.**




**-Dêwê bê mirês serê wî ket nav ava çem. Av pijîkî derdo ra wî û ne ma bi ser avê ket.**

**Dêwê ne xweşik û zalim bi wî awayî giha heqê xwe û mîr.**



**Ji wê demê û virde, xelk bê tirs li  
ser wê pirê derbas dibe. Îdî kes  
serê wî dêwê nexweşik nabîne. Îdî  
kes wî dengê wî yê bi heybet nabihî-  
ze...**



**Piştî kuştina wî dêwî her sê hevalên  
zîrek bi kêfxweşî di nav wê mîrgê  
jiyana xwe berdewam kirin û roj bi  
roj Qelewtir bûn.**

## **DAWÎ**



## **DOSTÊ ÎNSANAN, KEVOK - 2 -**

**Kevok dikarin bi hezaran kilometre bifirin û dîsa vegerin hêlînên xwe. Ger merov wan bigre û bibe li cîyekî gelek dûr jî berde, dîsa ew dikarin bifirin û bêñ refikên xwe.**

**Di heyamên berê de, gelek merovan kovok perwerde dikirin, name bi nigêñ wan girêdi-dan û bi wî awayî têkilî bi hevdû re datanîn. Di sala 1870 de dema ku derdora bajarê parîs 4 mehan hatibû girtin, 150.000 nameyêñ resmî û qasî milyonek nameyêñ taybetî bi kevokan hatibûn şandin.**

**Di şerê cîhanê ya yekemîn de qasî 20.000 kevokên dî wêriyê de dihat bikaranîn, hatin kuştin. Di sala 1939 de wek qahramanêñşer 32 kevokên Îngîzan hatin xelatkirin.**

**Li Kurdîstnê jî îro bi hezaran kevokên bejî û kedî henin. Gelek mirov wan xwedî dikin. Gava kevokên xwe yên teqle difirînin û kevokên teqle, xwe i hewa teqle diin, kêfa xwedîyên wan û yên li wan temaşe dikin gelekî tê.**

**Li Kurdistanê gelek babetê kevoka henin û ji bo wan borange yên mezin avadikin.**

**Li gorî bîr û bawerîyên kurdan yên kevn, gava zarokên malekî di çelê xwe de dimirin, di gotin: "Ya heftekê lê xistîye yan jî cel pêketîye". Ji bona çel li dewsa zarokan bi cêlikê kevokan keve, cotek kevokên sor û bê nîşan xwedî dikirin. Wan kevokanan tu carî cotek çelikên xwe bi hevre bifirê nedixistin. Her gav ya hêkek wan xera dibû, yan jî çêlikek wan dimir. Li gorîwê bawerîyê, ew hêk ya ji ew cêlika dimir, dibû garîya zaroka wê malê...**

**Bê gûman di derheqa kevoka hîn gelek tişt henin, ku merov dikare binivîsîne û gelek tişt hene, ku merov dibê hîn bibe.**

**Bavê Hevî**

# **ROVÎ Û WERZÊ TIRÎ**

Rojekê ji roja Rovîyek di dora werzê tirî deher û tê û dixwaze têkeve nav rez. Lê belê havîdora werz bi dîvarê bilind hatibû rapêçandin û Rovî nikarîbû xwe di ser wê benda bilind çenke û tekeve nav rez. Gava rovî bê çare li dora benda werz diçû û dihat, qulek dît. Rovî xwest di wê qulê de derbas bibe. Lê ew qul gelekî bi çûk bû û Rovî nikarîbû dê re here. Rovî rabû sê roja xwe birçî hişt û Zeif bû û bi wî awa yi xwe di wê qulê derbaskir û ket nav werzê tirî. Rovî têr tirî xwar û zik li xwe kir cebeş. Gava Rovî xwest di qulê re derbas bibe, kir û nekir tê re derbas nebû. Rovîyê fenok bê çare ma û dîsa xwe sê rojan birçî hişt, ku xwe hejar bike.


Piştî sê rojan Rovî hejar bû bi wî aweyî di Quiê re derbas bû.

Rovî bêhna xwe berda û li werzê tirî nerî û got:

-Werzo, welleh tu xweş werz e, lê tu fayda te ji insana re tuneye. Ji ber ku, merov çilo birçî dikeve nav te, wilo jî birçî derdikeve.

Ev dinya jî wilo ye. Merov tazî çêdibe û dîsa tazî jê bar dike.

Murat  
Arnhem/ Holland



## QUNCIKA TARÎXA EDEBYATA KURDÎ


### Pertew- Begê Hekarî (XVIII) - 2 -

Wer xuyaye, ku zanyarê xoşewist Sadiq Bahadîn gelek wext û ked dayê wî karê giranbiha, ku destni-vîsarên dîwana pertew-beg li nav xelkê bide hev.

Gorî prof. Qanatê kurdo pertew-beg ji malbata mîrên Hekarî yê û ji ber wê bi navê Şa-pertew navdar e. Ji mala camer, xweş mîr baler û xêrxwaz da hatîye dinya yê... Cî û warêñ ew têda mezin bûye, cîye sîrişt, rengîn, bideşt û çîya, gol û havinge û zozan bûye. Ew cî û war cî yê zanestî û torê kilasîkê kurdî bûye, li wira gelek merovêñ pispor, zana, rewşenbîrêñ kurd, bi taybetî di sedaslîya 14-19, zanayêñ wek Elî Teremoxî, Elî Herîrî, Feqê teyran, Melê Betê, Ahmedê Xanî, İsmâîl Beyazêdî, Mûrad Xan, Şeref-xan, Siyapûş, Ebdulselam Babî û gelekê din. Kêm zêde pertew beg hay ji nivîsarên wan hebûye. Helbestêñ Dîwana Pertew beg piranî helbest û şêrên dildariyêñin. Lê hinek şerên wî hem bi fikira ewîntîyê, hem jî bi fikira çînayetîyê (ya dewlemendî û belengazî yê) hatine nivîsandin.

(Ji Tarîxa Edebyata Kurdî.Prof. Q.Kurdo)

## VAN HEJMARAN YEKO YEKO BIGHÎNIN HEV



## **Çirokek bi kurtî!**

Azad xortekî gundî ye nû gîhaye û gelek ciwane lê ji malbatek hejar e dehere bajêr ji bo ku xwîndina xwe bike. Lê ew bajar ne gelkî ji gund mestir bû ji ber vî tiştî herkesî hev nasdikir.

Rojîn jî keçek qandî Azad e. Lê ew qîza axayê gund e. Ew jî li wî bajarî dixwend lê ne keçika axa ba, nikarî bû daketa bajara û bixwenda. Azad û Rojîn di salakê hatibûn dinê û bi hev re li gund mezin bû-bûn û bi hevre hatibûn bajêr. Piştî çend salan ji teref xelkê jî hat zanîn ku ku Azad û Rojîn ji hevdu hez di-kin. Lê wek gelek civatên din, di nav me jî kesên ne baş û tolaz henin. Yek ji wan jî Silo ye.

Silo ji gundê Azad û Rojîn bû lê ew jî li wî bajarî dijî. Silo,bihîst ku Azad dil ketîye Rojîn û wek em di-zanîn kesê pîs tim koletîya axa dike ji bo çend quriş pera.

Silo, siwarbû û çû gund, çû mala Şerîfo kurê apê Rojîn û jêre hertişt got. Wer xweya dikir Şerîfo gelek bênamûs bû ew jî rabû çû cem apê xwe û keça wî Rojîn ji xwe re xwast. Ji bo miradê Azad û Rojîn bi-hevdu nebe.

Lê bi rastî ev tişt neket serê axê, ji ber ku Şerîfo xwedî jine û du zarokabû û ji keça wî gelek mezintir bû. Lê Şerîfo dev ji apê xwe nadiqerîya û her gav di-

hat wê dixwast . Lê apê wî tu tişt nama di destê wide, hema rabû du tişt xist ber wî. Ya yekê, jina xwe berde û ya dudûya jî xweha xwe bide Mecîdo kurê axê, birayê Rojîn.

Wek me go Şerîfo gelek bi namûs bû rabû devji namûsa bi çûk berda "dev ji Jina xwe û zarokên xwe berda" û xweha xwe da Mecîdê dîn. Ji bo ku çawa qîza apê wî dil ketîye xortekî hejar. Di nerîna wide ku evîna di nav keç û xworta de şerme". Rabû axe şand dû Rojîn, ji bajêr anî û bi zordarî hişt ku dev ji xwendîna xwe berde û kurê apê xwe bike. Ez serê we neêşînim Rojîn û Şerîfo hev kirin û Mecîdo xweha Şerîfo ji xwere anî. Lê Azadê reben rabû ji wî bajarî çû bajarekî mezin ji bo ku dûrî yara xwe here. Piştî çend salek derbasbû, du zarok ji Rojîn û Şerîfo re çêbûn lê ji ber ku Mecîdo dînoke bû û tu tiştî nizanîbû. Tu zarok jêre çênebûn. Rabû axa hişt ku Mecîdo jina xwe berde ji bo jêre jinek din bîne, ku zaroka bîne. Rabû Mecîdo jina xwe berda. Ji bo ku jina Mecîdo berdêlî bû, diva bû ku Şerîfo jî jina xwe berde, wek çawa xweha wî hatibû berdan.

Azad dûrî welatê xwe ket û wendayî ma. Rojîn û herdu zarokê xwe wendabûn...

Şerîfo nehişt ku keça apê wî dil dikeve xortekî , jê re bibe yar. Û ya talî Silo tenê derket bi sermîyanekî perelî ji vê tevgera han...

Şûro Bavê RÎTA

## PÊZANÎN



1) Her-her dîwar  
Mermer dîwar  
Xatûneke, çel nobetdar.  
Ew çiye?

2) Dîkek e, dîkwanek e,  
Çar mîhin, beranek e,  
Ew çiye?

3) Çi ji balgî nermtir e?

4) Xan-manekî tarî  
Tijî stûne çiloxwarî  
Ew çiye?

# QUNCIKA XÊZIKAN



## **QUNCIKA BAJARÊN KURDISTANÊ**

### **Bingol (Çapaxçûr) - 3 -**

**RUNIŞTEVAN:** Hejmara rûniştevanê Çapaxçûrê tev qeza û gundên wê di sala 1940 de 70 hezar bû. Îro 178 hezar rûniştevan jîyana xwe didomînin. Rûniştevanê ku li bajêr rûdînên 18 hezar in.

Di sala 1971 de erdhejaneke (zerzelak) gelek mezin çêbû. Gelek mirov bin ax bûn. Di pêy erdhejanê de, bajar ji nû ve hat avakirin.

Di navbêra bajêr û gundan de tîkilî ne zêde ye. Berî her tiştî rê pir kêmîn. Li gelek gunan elektirîk tunene. Gel bi tore û adetê xwe ve pir girîdayî ye.

**TURÎZM:** Eserên (berhemên) kevn ne gelek in. Kelayek kevn bi navê Dara-Hînî li rojhilatê Gencê heye. Li gorî tê gotinê; Qiralê farisan

Dara ev kela han ji bo keça xwe 2600 sal berê avakirî ye.

Lê çiyayên Çapaxçûrê bi serê xwe xezînake. Bi sedan çîrok û destan li ser wan çîyan têن gotin. Gerokê Tirk Ewlîya Çelebî di pirtûka xwe de dibêje: Serê van çîyan deryak e. Ava vê derya yê ava jîyanê û ne mirinê ye.

Dîsa dibêjin, Koroglu jî bi hespa xwe ya boz li van çîyan maye.


Dema mirov bahsa Çapaxçûrê bike, divê avgermên wê neyên jibîr kirin. avgerma Dîk-pinar ji bo pizikên rûyan û hemû nexweşî yên çerm, avgerma Çeşme jî ji bo bawî bûnê derman in.

**FOLKLORE (ZARGOTIN):** Merovin vir bi piranî şelwer li xwe dikin.

Lîstikêن Çapaxşûrê bi nav dişibin lîstikêن herêmên derdora xwe. Lê di lîstikan de gelek guhertin hene. Lîstikêن bi nav û deng Govend e. Horanî û Marê reş (Çaçam) jî gelekî têن lîstin.

Xwarina herî tê naskirin Kumbe, Şêranîya  
hesin in. Zebeş û gûz ê Çapaxçûrê jî bi nav û  
deng in.

- DAWÎ -



# LÎSTIKÊN ZAROWAN

Beşîr Botanî

**Demjimêr şêst lîdan in  
Lêdan şêst lêdanok in:**

Tik tik tik tik tik  
Tik tik tik tik tik

**Bû lêdaneke tekûz!**


**Demjimêr: Seet**

**Lêdan : Deqîqe**


**Lêdanok : Sanîye**

**Tekûz : Temam**

# MIJÛLÎ



# QUNCİKA MATAMATİKÊ



$59+32=$  \_\_\_\_\_

$74-22=$  \_\_\_\_\_

$47+28=$  \_\_\_\_\_

$85-43=$  \_\_\_\_\_

$23+75=$  \_\_\_\_\_

$59-41=$  \_\_\_\_\_

$38+42=$  \_\_\_\_\_

$99-23=$  \_\_\_\_\_

$13+86=$  \_\_\_\_\_

$83-62=$  \_\_\_\_\_

$55+27=$  \_\_\_\_\_

$78-33=$  \_\_\_\_\_

$28+43=$  \_\_\_\_\_

$65-52=$  \_\_\_\_\_

$35+53=$  \_\_\_\_\_

$97-34=$  \_\_\_\_\_

$26+63=$  \_\_\_\_\_

$86-53=$  \_\_\_\_\_

$47+47=$  \_\_\_\_\_

$68-16=$  \_\_\_\_\_

## HELBEST

Ez rabûm ji wêderê,  
Berê xwe mi da bênderê,  
Esmer bi mir soz dabû,  
Wekî her car li wêderê.

Çavê mi li te digerîya  
Eşqa dil di fûriya,  
Evîna te ez dîn kirim,  
Ma te çi doz li mine.

Pencerê de rûniştî bû,  
Eşqa wê ez kuştibûm  
Nema dil bawer dike,  
Go tu ji mi hez dike,

Carek were em tev rûnên  
Gazinê xwe bi hev bikin,  
Ne heqe go tu wanî,  
Dilê min tu bişkînê,

Evîn xweşe bi dilsozî  
Ne weke te bicanbazî  
Ez evîndarê te bûm  
Bi dilekî paqij î...

Bi sala me ji hev hezkir,  
Me rabû dest ji hevkir,  
Ev dilêmin birîn ma,  
Derman jêre pêde nekir.

Ji te dûrketim bi dilkî xemxwar  
Evîndar mam bi dilkî sar,  
Sal buhurî ez bi gorî  
Name te şand bo vegerim.

Gelek soz da ciwanamin,  
Fedî neke dotmama min,  
Tu derman bû bo birînê  
Derman nekir birîna min

Evîn xweşe li cîhanê  
Ne wek min û telê canê  
Gelek wek me dilşadbûne,  
Em tenê man cîrana min.

Şoreş  
Bavê Ahmed

# QUNCIKA MUZIKÊ

## Notenivîs: Cemîla Celîl

### HER WENDELÎ 16.

Andante




Her Wen-de-lî.	Wen-de-lî.	Her Wen-de-lî, Wen-de-lî.
Her Wendelî, Wendelî.	Her Wendelî, Wendelî.	Señê h'ircê û midûre.
Hûn werne, werne.	Her Wendelî, Wendelî.	P'arsuyê wî kirne hûre.
Hûn werne fewa h'ircê,	Her Wendelî, Wendelî.	H'irçek têye nav tirşika.
Her Wendelî, Wendelî.		Her Wendelî, Wendelî.
H'irçek têye gelyê k'îre,	Her Wendelî, Wendelî.	Señê h'ircê û semsika.
Her Wendelî, Wendelî.		Her Wendelî, Wendelî.
H'irçek têye nav malane,	Her Wendelî, Wendelî.	
Her Wendelî, Wendelî.		Señê h'ircê û be'ravane,
		Her Wendelî, Wendelî.
		Her Wendelî, Wendelî.
		Her Wendelî, Wendelî.


# XAÇEPIRS



2



5



6 : ?



3



4



1

## **BERSÎVA PÊZANÎNAN**

**1)Vî alî gelî, wî alî gelî**

**Ortê da şûrekî şîn.**

**Ew çiye?**

**Bersiv: Ziman**

**2)Vî alî dîwar, wî alî dîwar**

**Ortêda girêdaye seyekî har,**

**Ew çiye?**

**Bersiv: Ziman**

**3)Odeka şuştî-muştî**

**Çil feqîr têda rûniştî**

**Ew çiye?**

**Bersiv: Dev û diran**

**4)Vî alî aş, wî alî aş**

**Ortêda topê qumaş**


**Ew çiye?**

**Bersiv: Dev û Ziman**


## BERSİVA XAÇEPIRSAN



6



1



5



3

T  
A  
W  
E

A vertical stack of four boxes with arrows pointing upwards, labeled T, A, W, E respectively.

2

M  
A  
S  
T  
E  
R  
K

A horizontal row of seven boxes, the second one containing an R, labeled MASTEK.

3→

K  
U  
R  
S  
I

A horizontal row of five boxes, the fourth one containing a K, labeled KURSİ.

4→

Ç  
E  
L  
O  
K

A horizontal row of five boxes, the first one containing a Ç, labeled ÇELOK.

5→

K  
È  
R

A horizontal row of three boxes, the first one containing a K, labeled KÈR.

6→

B  
I  
Ş  
K  
O  
K

A horizontal row of six boxes, the third one containing an I, labeled BİŞKOK.


7→



4



7




**KEREKÎ ME HEBÛ Û KUNDIRKÎ ME**

**KERÊ ME KUNDIRÊ ME KOT KOT KOT**


**ME JÎ ÇIROK Û MESELÊ XWE**

**YÊN VÊ HIJMARÊ JI WERE GOT**

**Kulîk**







YAN

# KURDISTAN

YAN NEMAN !



UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA CANDA KARKERÊN KURDISTANE

ADRESS - NAVNİŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr  
BIHA